

ÎRAN PÎŞTEVANÊ HERÎ ÇELENG YÊ TERORÎZMÊ DÎ CÎHANÊ DE YE

► Wezaretê Karê Derve ya Amerîka rapora salane a xwe ya derbarê terorîzmê, roja 30'ê Nîsana 2009'an çap û belav kir.

Di vê raporê de, Elqaîde her weke berê gef û hereşeya herî mezin a terorîstî hatiye hesabandin û Komara Îslamî a Îranê weke piştevanê herî çeleng ê girûpên terorîstî hatiye nasîn.

Ji bilî rejîma Îslamî a Îranê, welatên Sûdan, Sûriya û Kûba jî di fihrista reş a welatên piştevanên terorîzmê de cih girtine.

Di vê raporê de bas ji piştgirî û piştevanîkirin ji Sipaha Quds – girêdayî bi Sipaha Pasdarên Şoreşa Îslamî a Îranê – û ji tevgerên tundajo ên Filistinî weke Hamas, Hizbulaha Lubnanê, Cehada Îslamî û çekdarên tundajo ên Îraqê û Talîban li Efxanistanê ji aliyê dewleta Îranê ve hatiye kirin.

Ev rapora nû a DYA'ê a derbarê terorîzmê, dide xuyakirin ku beşdariya Îranê di bernamedarêtin û piştevaniya malî (diravî) ji êrişên terorîstî li seranserê Rohhilata Navîn, Ewropa, Asyaya Navîn, bandoreke rasterast li



ser hewildanaên navneteweyî bona cihgirkirina aştîyê heye û gefek mezin bo ser ewlehiya aborî, tenahiya herêmê ye û bi van kiryarên xwe pêvajoya xurtkirina demokrasiyê jar û lawaz kiriye.

Li Rohhilatê Kurdistanê Dehan Çalakên Karkerî Hatîn Girtin

► Bi henceta Roja Cîhanî a Kedkaran, roja îne, 1'ê Gulana 2009'an, di bajarên Kirmaşan, Seqiz û Sine de, rê û resmên taybet hatin lidarxistin. Bi vê sedemê li Sine zêdetirî 22 karker ji aliyê hêzên rejîma Komara Îslamî a Îranê ve hatin girtin.

Li bajarên Kirmaşan, Sine û Seqizê serbarê çavdêriya xurt a hêzên ewlekarî û întizamî ên rejîma Îslamî a Îranê, karkerên Kurd li hev civiyan û ew roj pîroz kirin. Karkeran daxuyanî weşandin û li ser hewcehiya pêkanîna tenahiya karkirinê û hilneweşandina girêbestên demkî tekez hate kirin. Karkeran serbarê nerazîbûna xwe li hember miasê kêm yê diyarîkirî ji bo kedkaran ji aliyê Şewra bilind a kar ya Îranê û tekezkirin li ser dana miasê mehane û daxwaziyên qanûnî ên karkeran, daxwaza wekheviya mafê wekhev ên jin û mêran di kar de û wergirtina tevahiya karkerên derkirî kirin û serbestberdana kedkarên girtî kirin.

Raporek berfireh li ser rewşa kedkarên kurd di rûpela 7'an de bixwînin...



Kirmaşan



Sine

Gotûbêjên
Amerîka û
Îranê ber...

2




Bahoza weşetê li
"Jaffna"

4



Rûmeta Mirov

9



Gotûbêjên Amerîka û Îranê ber bi kuderê?

Mistefa Hicrî

Barak Obama di kampanya hîlbijartinên Serok Komariyê de soz da xelkê ku bi Îranê re gotûbêjê

bike û pirsgrîkên di navbera wan de bi rêya aştxwazane ve çareser bike. Piştî hatina wî ji bo Koşka Sipî, dixwaze soza xwe bîne cî û her bi wê meramê jî di heyamê derbazbûyî de bi hilgirtina çend gavan di pêvajoya vê armancê de xweastiye rawêşke baş û cihê hitbar û baweriyê biafirîne. Bo mînak em dikarin peyama pîrozbahîya Obama bi hilkevta Newrozê ji bo xelkê û hikûmeta Îranê, beşdarîkirina Îranê di konferansa Efxanistanê ku di berrav 31.03.2009'an de li bajarê Lahe hate lidarxistin, bas bikin. Çavniherî tê kirin ku di pêşerojê de gavên din ên bi vî awayî bavêje.

Zahira vê pêşdestîkirina Amerîka bi tevahî lojîkî û cihê pejiwandinê ye û tu takekes û komek hemdem û pêşketinxwaz nikare haşa ji vê rastiye bike ku çareserîya aştxwazane ji bo xalên nakok û dijhev baştirîn çareserî ye û heta ev rêye di ber dest de be, nabe tundûtûjî weke rêçare bihê hîlbijartin, lewra civaka navneteweyî pêşwaziyê ji vê piroje û gava Obama kir û çavniherê encamên erênî yên vê prosesê ye.

Ewa ku di vê nivîsarê de em dixwazin bixin berbas, ewa ye ku ev prosesê heyameke gellek dirêj dê bixşîne, lê nagihîje encama dilxwaz a Amerîka û aliyê ku sûd û qazancê lê werdigire, Komara Îslamî a Îranê ye. Ev nêrîne jî ji van rastiyan ve çavkanî digire:

Ji bilî pîrsa mafê mirovan û demokrasî ku di heyamê nêzik 30 salên borî de ji aliyê rejîma Komara Îslamî di Îranê de hatiye binpêkirin û ji hêla dezgehên têkildar ên vê pîrsê li Amerîka û Ewropa bi dehan caran rejîma Îranê hatiye mehkûmkirin, lê tu demekê ne Komara Îslamî û ne wan welatan jî ku biryarnamaya şermezarkirinê li dijî Îranê der kirine, mijara han bi giring nezaîne, hinek xalên nakok û dijhev ên gellek girîng di wê navberê de hene ku ji bo her yek ji van du aliyane pîr zehmet e ku paşdekişanê lê bikin û li ser wan li hev bikin.

Amerîka dixwaze bi gotûbêjan Komara Îslamî razî bike ku aliyê kêm:

- Dest ji meyndin û zaxkirina Uraniyûmê berde, ji ber ku Amerîka jê ve ye ku armanca Îranê bidestxistina çeka navikî ye, her çend Îran ev îdeaya Amerîka red kiriye.

- Dest ji piştgirî û handana girûpên tundrew û neyarên Îsrailê weke Hizbulah û Hamasê hilbigire, bona vê yekê ku ew navçe aram û ewle bibe û pirsgrîkên wan bi diyalogê bihê çareserkin.

- Destwerdan li kar û barên hundir ê wan welatên deverê neke, nemaze ew welatên ku bi dostên Amerîka dizane.

Lê siyaseta Îranê di herêmê de bi tevahî

di pêvajoya dijberîkirin li pêkhatina vê encamê ye ku Amerîka çavniheriya wê dike.

Derheq domandina meyndina Uraniyûmê, bilî vê çendê ku di vê derbarê de rejîma Îranê gellek pêşde çûye û mesrefek zaf jî kiriye, heta amade bûye bandorên dijwar ên 3 biryarnameyên Konseya Ewlekariya Neteweyên Yekbûyî li dor dorpêçên aborî bo ser welatê xwe tab bike û heta niha jî bala xwe nedayîye koma 5+1, heta paketên alîkariya aborî, siyasî û pîşesazî ên wan di pêxema pejiwandina daxwaza wan red kiriye, tu belgeyek jî bona vê yekê di ber dest de tune ku hêviya destberdana rejîma Îranê ji vê karî nîşan bide. Ewa ku di vê pêvajoyê de di holê de ye, îsrar û tekezîkirina wê rejîmê li ser domandina vê bernamê ye heta gehandina prosesê han bi encamê ku pêkhatî ye ji bidestxistina çekên Etomî.

Sedema vê tekezîkirinê jî vedigere ser wê rastiye ku Komara Îslamî a Îranê li dijî hemû pîrensîp û biryarên navneteweyî ye û

“Her weke salên berê ku gotûbêj bi Îranê re bêencam bûye, di pêşerojê de jî bêencam be û di dawiyê de Amerîka û hevalbendên wê jî dê ji vê rastiye tê bigihîjin, lê wê demê dê gellek dereng be”

li gora bîr û baweriyên îdeolojîk ên xwe nikare bi wan biryar û pîrensîpan re bigunce, lewra dijberîkirina Komara Îslamî digel çihana pêşverû û nemaze Amerîkayê dijberîyê berdeyam e. Madem ew dijberîkirina kûr di holê de ye, hitbarê nake û jê ve ye tenê rêya vê yekê ku hikûmeta xwe ji êrişê dijminan biparêze, bidestxistina çekên navikî ye. Lewra ji bo wan kes û aliyên ku li ser Komara Îslamî û pêkhatiya fikrî û dîtin û nêrînen wê şareza ne, gumanek namîne ku her weke salên derbazbûyî di vê derbarê de gotûbêj bêencam bûye, di pêşerojê de jî dê bêencam be û di dawiyê de Amerîka û hevalbendên wê jî dê ji vê rastiye tê bigihîjin, lê wê demê dê gellek dereng be. Her bi vê sedemê jî demekê Obama li Enqere digot: “Niha rêberên Îranê divê di navbera hewildan bona çêkirina çek (merem çekên navikî ye), yan çêkirina pêşerojêke baştir ji bo xelkê wî welatî yekê hîlbijêrin.”, nabe guman hebe ku Komara Îslamî dê ya yekem hîlbijêre, ji ber ku derbazbûyî jî nîşan daye ku ji bo rejîma Îranê pêkanîna jiyana baştir ji xelkê welatê



wê ne girîng e û balê jê re nade û hemû tiştêk – yek ji wan çekên Etomî – demekê nîrx û biha heye ku di pêxema parastina desthilat û berdeyamîya rejîmê de be.

Pirsgrîka navbera Îsrail û Felestîniyan û dijberîkirina Komara Îslamî bi Îsrailê re û piştewanîkirin ji girûpên tundjao ên dijberên Îsrailê weke nemeteke mezin ji bo Komara Îslamî a Îranê hilketiye, heta ji wê rêyê ve nîfûz û desthilata xwe di nava koma misilmanên ereb ên xwe weke take dilsoz û berevkarê Filistîniyan bide xuyakirin û bibe qehremanê dijberîkirin bi Îsrailê re li hember dewletên erebî ên deverê ku her yek ji wan bi awayekê dixebitin vê pirsgrîka qedîmî ji rêya gotûbêjê ve çareser bikin. Komara Îslamî bi sedema ew dewr û rola ku di herêmê de difîze, ji bilî pîrsa Îsrailê, bona haydana hikûmetên erebî di navçeyê de jî ji vê alavê mifahê werdigire û bi piştgirîya xelkê nerazî bi taybet nîfûsa Şîe a niştêcih ya wan welatan û girûpên terorîstî ên dijî Amerîka û Îsrailê li dijî desthilatdarên ereb ên navçeyê weke ehromeke zext û givaşê li ser stûyê wan hukûmetan disekinîne û bi wê sedemê ve her dema bixwaze di welatên wan de ajawe û têkderiyê pêk tîne û wan ditirsîne. Ewa jî sedemek e bona ku ev welatên ku di warê olî û awayê desthilatdariyê de bi tevahî li dijî rejîmê ne, newêrin li dijî Îranê gellek serê xwe bilind bikin. Heke pirsgrîka navbera Îsrail û Filistîniyan bihê çareserkin, Komara Îslamî tu hêceteke din ji bo nîfûz û desthilata xwe di nava xelkê welatên Erebi ên Rojhilata Navîn de namîne. Bi vî awayî em de bigihîjin vê encamê ku domkirina şer û aloziyan di navbera Filistîn û Îsrailê de derfeteke binîrx ji bo Îranê ye û aşî û ewlehî jî bi ji holê rakirin nîfûza Îranê di herêmê de misoger nabe. Bi vî awayî çawa dibe Amerîka çavniher be Komara Îslamî bi gotûbêjê dest ji vê nemeta mezin berde? Amerîka dikare li hember stûxwarkirina rejîmê çî bide Îranê ku pê re razî be. Destwerdan di nava kar û barên welatên deverê de ji bo Komara Îslamî a Îranê bîr û baweriyê îdeolojîk e û weke erkeke Îslamî lê dinêre. Merem eva ye, ji roja ku hate ser kar û desthilat girte dest, vê rejîmê şandina şoreşê weke erkeke olî ji xwe re daniye û di vê rêyê de dixwaze hikûmetên deverê – heta eger Îslamî jî bin

– biguherîne û hukûmeteke Îslamî şibê Komara Îslamî a Îranê li wir ava bike. Bi vî awayî nifûz û desthilata Amerîka di wan welatan de ji holê rake û bi xwe bibe hêza mezin a bê wir û vir ya herêmê. Îran baş dizane heke vê siyaseta neparêze, Amerîka dê desthilata xwe di herêmê de bisepine û dê herdem ji bo Komara Îslamî a Îranê xeterê pêk bîne. Lewra destwerdan di nava kar û barên welatên navçeyê de ji bo Îranê armançeke olî ye ku di xizmeta siyaseta wê de ye û zehmet e ku dest jê berde.

Dema herî xirab ji bo gotûbêja Amerîka bi Îranê re

Ji bilî wê şrovevê, hewce ye em vê rastiyê jî diyar bikin ku ew deme, çaxê herî xirab û ne bicî ji bo vê gotûbêja Amerîkayê ye. Sedemên wê jî zaf in. Em dê li vir li ser yek ji sedemên herî giring ên vê rewşa nebaş bisekinin:

Di vê demê de:

Amerîka biryar girtiye pîrriya hêzên xwe ji Îraqê derbixe, paşde bikşîne. Bi wî karî jî Îran dê bikare ji berê çêtir desthilata xwe di wî welatî de xurt bike û pêşde bibe. Hatîn û çûnên yek li pey hev ên rayedarên payebilind ên rejîma Îranê di heyamê 1-2 mehên borî de ji bo Îraqê, vekirina kunsolxaneyê nû li bajarên Hewlêr û Silêmaniyê, ji bilî kunsolxaneyên wê li bajarên din yê Îraqê û gellek hewl û cehdên nepenî û eşkere ên vê rejîmê li Îraqê ku hemû vedigerin bo vê merem û armançê.

Di Efxanistanê de, Talîban û Elqaîde bihêztir bûne û desthilata xwe di parek zaf a vî welatî de xurt kirine, ne tenê ew, belkî bihêzbûna van girûpane ji rêya Pakistanê jî bi heman awayê xuya dike. Amerîka heta niha nekariye van girûpan serkut bike û heta bona vê meremê di konferansa Lahe'yê de ku roja 31'ê Adara 2009'an ku bi armanca çareserkirina wê pirsgrîkê pêk hat, bi neçarî Îran jî hate vexwandin heta ku beşdariyê di civîna han a navneteweyî de bike. Çareserkirina pirsgrîka Îsraîl û Filistinê ji rêya aştîyê ve ku armanca Amerîkayê ye, her aloz e, her wekî me qala wê kir, sedema sereke a wê vedigere ji bo Îranê. Bi van guhartinên di herêmê de, niha Komara Îslamî xwe bi serkevî û birî û Amerîka jî bi torandî dizane. Lewra hinde din jî li xwe derketiye. Lewra, gotûbêja Amerîka tevî Îranê di dema niha de - bi dîtina Komara Îslamî – diyalog serkevî û torandî ye û di gotûbêjêke wilo de rengê vê hindê nade ku serkevî bersiva daxwaz û xwestekên aliyê torandî bide, yan dest jî zêdexwaziyên xwe berde, bi taybetî ku ev alî Komara Îslamî a Îranê be. Li xora nîne ku di konferansa Laheyê de ku bi armanca alîkarîkirina bi hukûmeta Efxanistanê bona serkutkirina Elqaîde û Talîbanê pêk hat, nûnerê rejîma Îranê, pirsgrîkên Efxanistanê vedigerîne ji bo hebûna hêzên Amerîka li Efxanistanê û pêşniyar dike ku ew hêz Efxanistanê bi cî bihêlin.

Encam

Destpêkirina piroseya gotûbêjên Amerîka bi Komara Îsamî a Îranê re di rewşa niha de hewcehî bi demeke dirêj heye, ji ber ku rejîma Îranê bêyê wê çendê ku gotûbêjê red bike, her carê hêcetekê peyda dike û astengekê der dixwe ser rêya wê pirosesê bona ku di wê mîdehê de çî tiştê bê kirin, demdirêtir be. Encama wê jî dibe ewa ku di wê heyamê de, Îran demeke beş û hêja dê bidest bixe bona xurtkirin û pêşdebirina bernamaya xwe a navîkî û qahîmkirina zêdetir a cî pêyê xwe li deverê û bihêzkirina Îslama binajo bi merema gefxwarin ji hukûmetên herêmê û berjewendiyên Amerîka û hevalbendên wê. Di hember de, gellek zehmet û dijwar e ku tiştê bikeve destê Amerîka û hevalbendên wê, bilî vê çendê ku koma 5+1 di heyamê gotûbêja çend salên derbazbûyî de, 3 biryarnamayanê Konseya Ewlekarî a Rêxistina Neteweyên Yekbûyî bona cezakirina Îranê dest wan ketiye.

Mafê Mirovan



Nivîsin: Peter R. Baehr
Wergeran: Mecid Heqî

Rola Mafê Mirovan Di Siyaseta Dereve De

Cîhanîbûn û rêlatîvîzma çandî

Cîhanîbûna peymanên navneteweyî yê mafên mirovan bi wê hegerê ye ku girîmana (ferz) wê yekê ku ew mafane cîhanî ne û li gor hemû norm û kiryanan cihê pesendê ne. Ewa mijarek giring e di nav tiştên din de, Ji bo rola zêrevaniya Neteweyên Yekgirtî bo

birêveçûn û rêzgirtin li wan standardên navnetewî. Hetanî ku mafên mirovan an jî bi kêmanî kakila wan mafane bi awayekî cîhanî derbaz nebin, Neteweyên Yekgirtî tu bingehêk ji bo zêrevaniyê tune ye.

Ew girîmane bingeha pesendkirina Carnameya Cîhanî ya Mafê Mirovan di sala 1948'an de li civîna giştî ya Neteweyên Yekgirtî pêk anî. Ew carnameye bi wê awayî dest pê dike ku "nasîna hurmeta, zatî ye û mafên yeksan û bê kêmasî yê hemû endamên malbata mirovahiyê li ser bingeha serbestî (azadî), dadperwerî û aştîya cîhanî hatiye damezrandin." Ewa her wisa bingeha pejirandina du (2) peymanên din yê mafên mirovan in ku di sala 1966'an de, hatin pesendkirin.

Lê belê qebûlkirina wan deqane bi wataya wê yekê nayê ku sirûstê cîhanî yê mafên mirov hatibe cîhgirtin. Hinek ji rexneyên giştî li ser Carnameya Cîhanî ya Mafên Mirovan ev in:

Ew peymanê di serdemekê de hate pejirandin ku piraniya welatên Cîhana Sêyem hîna bi destê kolonyalîzmê bûn, neteweyên li halê geşekirinê ên ku di dawî de standardên Carnameya Cîhanî qebûl nekirin û di dawiyê de di bin zexta dewletên rojava di bin navê Rêxistina Welatên Amerîkî û Rêxistina Yekîtiya Afrîqî de.

-Lewma gellek çarên hatiye gotin ku mafên ku di Carnameya Cîhanî de hatine dîtin û îdeolojîya welatên Rojava ye û nixê cîhgir li welatên bin bandora rojava nebin, nînin.

-Deklarasyona mafê mirovan bi awayekî takekesî (îndîvîdualistî) bi pîrsa mafê mirovan re nêzik dibe ku ewa jî bo wan civakên ku xwediyê nîrxên kolêktîv in, bikar nayê.

Rêlatîvîzma çandî

Girêdahiya çandî ya ramana "rêlatîvîzma çandî" kûrtir diçe: Alîgirên wê hizrê li ser wê baweriyê ne ku kevneşopên çandî, herêmiyên olî, siyasî, abûrî û yasayî ji aliyê civakên heyî tîr biryardan û mafên takekes girêdayî bi wê civakê ye ku têde dijîn. Her wisa tê gotin ku pîrsên exlaqî û standardên tîkîdar li gor dem û cîh tîr guhartin. Ew cudahiyanê demekê tîr fehmkirin ku bê zanîn ew nîrx û buhayane beşek çand, kûltûr û derbazbûyîyên curbicur in. Girîmana wê yekê nehatiye kirin, ku bo mînak exlaqê hevbeş yê cîhanî hebe, ji ber ku cîhan hertim xwediyê taybetmendîya pîloralîzma çandî bûye.

Dîtina han dikare bibe hegerê wê yekê ku standardên navneteweyî yê mafên mirovan, gellek dûr bikevin.. Ger her tiştêk bi çanda xwecî û herêmi bî girêdan, cîhek bo yasayîbûn û giştîgîrbûna standardên navneteweyî yê mafên mirovan namîne. Lewra rêlatîvîzma çandî xasmayî encamên tund ên wê bi tundî hatiye dijberîkirin. Siyasetzanê Kanadayî "Roda Haward" rêlatîvîzma çandî bi alavek ji bo parastina berjewendiyên xwedî desthilatan zaniye. Heta ew kesên ku alîgirê rêlatîvîzma çandî ne, diviya wê yekê qebûl bikin ku cîbicîkirina mafên mirovan di çandên cur bi cur de wê dixwaze ku di hin rewşan de diviya mafê mirovan giraniya zêdetir li kiryanên din hebe. Ewa jî şaş nîne. Gellek çarên li civakên ku xwendin û nivîsandinê nizanin, serbestiya ragehan din û azadiya rederbîrrînê watayek pîrri nadet. Lewma hinek belkî dîtina Donnely ya derbarê "rêlatîvîzma lawazya çandî" qebûl bike. Bi hizra wî, çand serekaniyek giring ya derbarê cîhê bawerîbûna mafên exlaqî û rol û yasayîyên exlaqî. Li gor wî ewa rêya zêdexwaziyê di asta cîhanî de digire. Ewa bi wê wateyê nayê, ku diviya mafê bingehîn, ew mafên ku pêwendî bi hurmeta însanî hene bîrê pestekirin. Ji wan mafane mafê jîyanê, mafê nehatin îşkencedan an jî nehatin cezrebandin bi awayekî zalimane, an nehatin sivakatî pê kirin û cezadan û mafê serbestiya xwe derbîrrîne. Piraniya alîgirên rêlatîvîzma li ser wê baweriyê ne ku diviya mafê mirovan herderî bê rêzlêgirtin.

RONÎ

Quncikek ji bo şiroveya bûyer û babetan ji xwendevanên "Agirî" re

Ebdullah Hicab - Oslo 29.04.09



Bahoza wehşetê li "Jaffna"

Girava Jaffna, navneda têkoşîna Teverga Pilingên Tamîl (LTTE), ku ji sala 1983 ve ji bo serxwebûna

herêma Tamîl Eelam li "Sri Lanka" xebat dikin, di wan rojên dawî de ketiye ber hêrişê herî xurt ya artêşa "Sri Lankayê". Dîmenên kesên ji ber hêrişan direvin, hawar û nalîna birîndar û koçberan, koçreva sala 1991 ya Başûrê Kurdistanê tîne ber çavên meriv. Artêşa "Sri Lanka", ku di hêrişên vê dawiyê de serkevtînek berçav bi dest xistiye, radigihîne ku bi biryar e heta tevgera Pilingên Tamîl bi hêza çekan tev bişkêne. Agirbesa vê carê ya tevgera Pilingên Tamîl ne dengvedana cihanî heye û ne jî guhên guhdar li "Sri Lanka". Şer di qonaxek herî hestiyar de ye û gelê sivil yê herêmê weke qurbanîyê sereke yê şer, niha ji azadiyê pitir difikire ka dê heya roja paştir bijî an na. Jaffna ya ku hê ji birîn û azarên tsunami ya sala 2004'an nehatibû ser halê xwe ve, vê carê bi "tsunamiya" çek û bombeyan re rûbirû ye.

Şerê li navbera gerîlayên Teverga Pilingên Tamîl û dewleta "Sri Lanka" ku ji Sîngaliyan pêk tê, ji destpêkê ve heya niha bi gellek qonaxan re derbas bûye, lê xuya ye niha dema dema hisaba dawî ye. Bi ji destdana herêmên xwe yê azad, tevgera Tamîl tu riyên dî nînin ji şerê gerîlayan bi der. Encam û destkevtiyên şerek weha dê çî bin, tenê dema pêşîya me dê bikare bersivê jê re bide. Lê awirek ji dîroka "Sri Lanka" û rabihoriya gelê Tamîl li welêt, nîşan dide ku şerê niha ne çareseriyê bi xwe re tîne û ne jî aştî û ewlehiyê tîne welatê hevpar yê Tamîl û Sîngaliyan.

Herêma ku bi welatê Tamîl an "Tamîl Eelam" tê naskirin, dikeve başûrê "Sri Lanka" ku gireva Jaffna paytextê herêmî ya wê ye. Xên ji devera Jaffna, giravên Alanativu, Eluvativu, Delft, Karaitivu, Kayts, Mandaitivu, Nainativu, û Punkudutivu navendên sereke yê xelkê Tamîl in. Li gor hejmara xelkê "Sri Lanka", ku 21 500 000 kes e, herêma Tamîl biçûk e. Tenê 18% xelkê welêt Tamîl in ku beşek berçav ji wan jî, koçberên dema kolonyalîzma Bîrtaniya ne ku ji bo xebata di zeviyên çayê de, Îngilîsiyan ew biribûn Seylan a wê demê û li herêmên cuda bi cî kiribûn. 74% xelkê "Sri Lanka" sîngalî û yê din musulman û mesîhî û hwd in.

Rûniştvanên herêma "Tamîl Eelam" heya berî destpêkirina şer ji Tamîl, Sîngalî û Musilmanan pêk dihat. Tamîl, piraniya rûniştvanan bûn û yê din musulman û

sîngalî bûn. Lê piştî şerê ku ji salên 1980 ve dest pê kiribû, rewşa demografiya herêmê bi darê zorê hate guhertin. Di destpêka salên 1990 de rêxistina Pilingên Tamîl (LTTE), ji bo xurtkirina hilkevta xwe li hember hevrikan û dewleta "Sri Lanka", hemû musulmanên herêmê ku hejmara wan 75000 kes bû ji giravê derxistin. Her çend di pêvajoya gotubêjên sala 2000'an de rêxistinê lêbihorîna xwe ji musulmanan xwest û daxwaz ji wan kir vegeerî ser cî û warên xwe, lê ji çend malbatan bi der, kes venegeriya.

Gelê Tamîl yê li "Sri Lanka" xwe weke beşek ji neteweya kevnar ya Tamîl dihesibîne ku ji 80 milyon kesan pêk tê û li Hindistan, Indonêziya û Malîziya dijîn. Tenê li herêma başûrê Hindistanê, Tamîl Nadu, pitir ji 66 milyon Tamîlî dijîn. Dîroka Tamîlan bi kinayî 2500 sal kevn e.

Welatê "Sri Lanka" ku heta sala 1972 weke Ceylon (Seylan) di hate naskirin, dikeve başûrê rojhelata Hindistanê. Welat sala 1948'an ji koloniyaya Îngilîstanê xelas bû û serxwebûna xwe ragehand. Ça, fêqî û masî berhemên abûrî yê welêt in. Dîroka siyasî ya hemdem ya "Sri Lanka" gellek dijberî û arîşe bi xwe ve dîtîye. Dijberiya destpêkê li herêmê, di navbera Sîngaliyan û musulmanan de, sala 1915'an dest pê kir û bû heger ku musulmanên girava Seylan ji birêveberî û desthilata siyasî bèn avêtin. Li encama dijberiya hevbeş ya piraniya xelkê welat li hember siyaseta kolonyalîstî ya Bîrtaniya, di sala 1919'an de, Kongireya Neteweyî Seylan Ceylon National Congress (CNC) hate damezirandin. Kongreya ji Tamîl û Sengaliyan pêk hatibû, siyasetvanek Tamîl serokatiya wê dikir. Lê pîr pê neçû ku dijberî kete navbera her du gelan. Tamîliyan li hember siyaseta hîlbijartinan ku derfet dida sîngaliyan ku piraniya nûnerên parلمانê diyar bikin, nerazîbûn nîşan dan. Valiyê Îngilîsî "William Manning", bi siyaseta **perçe bike û birêve bibe**, dijberiyek xiste nava gelan ku wek bîngê ji bo kêşeya niha û arêşeyên pêş serxwebûna "Sri Lanka" tê temaşekirin.

Di destpêkê de Tamîliyan bi têkoşîna aştîyane dest pê kirin. Teverga destpêkê ya siyasî ya Komkara Tamîlên Seylan yê Arunachalam, "Ceylon Tamil League of Arunachalam" di sala 1923'an de li ser bîngê tevgerek din ya neteweyî a Tamîl ku di sala 1921'an de hatibû damezirandin, ava bû. Armanca tevgera nû xurtkirina hizra neteweyî di nava xelkê Tamîl de bû ku li gor siyaseta komkarê pêwîst bû weke

gelê Sîngalî xwediyê mafê diyarîkirina çarenivîsa xwe be. Tîrsa tevgerek ev bû ku Tamîlên ku piraniya wan ji aliyê desthilatdarên Îngilîsî ve ji bo kar ji Hindistanê re hatibûn anîn, nekarin di bin siya tevgerek hevbeş de bibin yek. Lewma komkarê hewl dida berî ku Sîngalî desthilata xwe bi hêz bikin, hizra damezirandina du herêmên ji hev cuda yê Tamîl û Sîngalî bidin rûniştandin. Di hember wê tevgerek de, sala 1925 tevgerek federalîst ji aliyê Sîngaliyan ve serî hilda. Ev tevgerek weke rêxistinê cuda li herêmên Tamîl û Sîngaliyan xwe bi rêxistin kir. Piştî serxwebûna "Sri Lanka" li sala 1948, tevgera federalîst pitir ji aliyê Tamîlan ve hate parastin, û paşan partiya Federal damezirand. Sala 1972 ev partî bi hin rêxistinê din yê Tamîl re kete nava hevbendiyek siyasî û bi hev re ewan Eniya Hevgirtî ya Tamîl damezirandin.

Tevgera neteweyî ya Tamîl, digel piştigiriya Tamîlên herêmên cuda yê "Sri Lanka", hêz û hizra xwe ji rûşenbîr û pêşengên netewî yê Tamîl li Hindistanê digirt. Eyaleta Tamîl Nadu ya Hindistanê hêzek madî û manewî ya xurt dida tevgera netewî ya Tamîl li "Sri Lanka", bi awayekê ku Eniya Tamîl bi wê piştigiriyê, di sala 1976'an de daxwaziya avakirina welatê serbixwe yê Tamîl dubare anî rojevê. Hevdem tevgerek navê xwe jî guherî û kir Eniya Hevgirtî ya Azadiya Tamîl, "Tamîl United Liberation Front – TULF". Eniya nû di hîlbijartina sala 1977 de hema hemû kursiyên parلمانê yê herêmên Tamîl bi dest xistin û têkoşîna ji bo sêrxwebûnê bi rîya aram û dîr ji şer û tundûtûjiyê hê xurttir kir.

Lê dijberiya desthilatdarên Sîngalî li hember daxwazên eniyê bû hegerê radîkaltirbûna tevgera Tamîl. Sala 1975'an, dema valiyê "Jaffna Alfred Duriappah" bi destê "Velupillai Prabhakaran" yê Tamîl hate kuştin, bi kiryar şerê çekdarî li herêma Jaffnayê dest pê kir. Li pey wê hêrişê re tevgera Pilingên Rizgarîder yê Tamîl ên "Eelam Liberation Tigers of Tamil Eelam LTTE", sala 1976ê hate damezirandin. "LTTE" bi hêrişê sala 1983 ku tê de 13 serbazên "Sri Lanka" kuştin, hebûna xwe selimand. Rewşa siyasî ya herêma Tamîl, bi xebata çekdarî ya tevgera Pilingên Rizgarîder yê Tamîl (LTTE) re hate guherîn. "LTTE" niha jî ji aliyê damezirênerê xwe "Velupillai Prabhakaran" yê 55 salî ve tê birêvebirin.

Dom di rûpela 7'an de...

Mêrxasî û Berxwedana şerê sê roje li gundê Ceterê

"Gelî Hevalan! Eger Hûn Çûn, Min Cî Nehêlin!"

Beşa 7



Silêman Keleşî

Her wek bas lê hate kirin, dijmîn ji destpêka şer heta tarîbûna hewa di hemû êrîşên xwe li hember Kadro û

Pêşmergegên egiştî û mêrxas de rastî têkçûnek mezin hat. Ewa ku dijmîn karî tede serkeftinê bi dest bîne û derban li hêzên Pêşmerge bixe û malên xelkê gund ser serê wan de wêran bike, tenê topbarana bêwestan bû ku di hate kirin. Di wî şerî de ku hejmareke mezin li hêzên dijmîn hatibûne kuştin û hember birîndarkirin, fermanderên wan ser hev daxwaza hêzên zafîr dikirin û mizgîniya serkeftinê didan karbidest û fermanderên serwetir ku wan hemû Kadro û Pêşmerge di gundê Ceterê de dorpêç kirine û xilasiya wan çî nabe! Ji ber wê yekê her dem û gawê hêzên zaf û bêhnvedayî dihatin meydana şer. Lêbelê hêzên wan gellek ji wê hindê jar û bêhêztir bûn ku bikarin li hember Pêşmerge armancên fermanderên xwe bi cî bînin. Fermanderên dijmîn bo qerebûkirina wan hemû şikestên xwe ku li dest cangozî û mêrxasên PDKÎ xwaribûn, sond û ehd kiribûn ku bi her qîmetekê be gundê Ceterê bigrin û her wisa hemû Kadro û Pêşmerge bi kuştin yan jî girtinê ji holê rakin. Dijmîn bi wan hemû şikest û kuştî û birîndarên xwe şet û har bibû. Lewma piştî tarîbûna hewa bi hemû hêz û qaweta xwe - ku li bajarên herêma Bakûrê Kurdistanê Îranê hatibûne anîn - êrîşeke berfireh ji hemû aliyên kire ser çeperên xortên çeleng ên demokrat di nava gund de. Şerê mezin û giran dest pê kir. Bi rastî gundê Ceterê dîsan bibû polekî agir. Eger heta niha mirov ber taw û şevqa rojê nedikarî gulên top, katyoşa û sîlahên din bibîne, bi tarîbûna şevê mirov dikarî ber şevqa agirê gulên ARPG, topan, Katyoşa û sîlahên dest ku ser hev dihatin barandin, bi rihetî hereket û bûyerên balkêş û tirsnaq di nava şer de bibîne.

Wê carê hêzên dijmîn di bin şerê gurs û giran de bi dana kuştî û birîndarekî yek car zaf karî dîwarê berxwedana mêrxasên gel ku di tevahiya rojê de dom kir, bişkinin û xwe bigihîjin nav gund û beşek ji gund bigre bin kontrola xwe. Dema ku hêzên dijmîn taxeke gund girtin destê xwe, êdî şerê mal bi mal û kûçe bi kûçe dest pê kir. Ewa rastî be dijmîn sond û ehda xwe anî cî û gundê Ceterê bi zordarî ji destê me deranî. Hewce ye bê gotin ku şer hinde tund û qurs û bê eman bû ku me nekarî cenazê şehîdên xwe jî xilas bikin. Ew ku ez bizanim heta du hevalên me bi birîndarî di malan de ketin destê dijmîn û her li wir hatin gulebarankirin. Şer bi tundî di nava kûçe û kolanan de dom dike. Dengê "allah ekber" û "biyaid teslîm şewîd" (Xwedê mezin e, werin teslîm bibin) ji aliyekê û

dengê Fermanderên siyasî û eskerî û Kadro û Pêşmerge jî ji aliyekî din ve ku digotin "lêdin ewa hatine nava destê me" û "tolê vekin û mêrxasiyê biafirînin" û ... tevî dengê hawar û qîrîna xelkê bêberevan ji hemû aliyekê ve di hate bihîstin. Gellek ji Pêşmerge bi dîtin û bihîstina wan deng û rengan wek derwêş û mestan lê hatibûn. Sir û serma, xwarin û vexwarin, tirs û mirin nedihate bîra wan. Ewa li dest û qaweta wan dihat, dikirin. Pêşmerge ji ber nerazan û bêhnvedanê çavên wan sor û pirça serê wan qij bibû, Hindî wan di nava kûçe û kolanan gund de senger girtibû û ketî erdê, hemû cil û bergên wan herî û qur bûn. Belê dijmînê dilrêş û hov karî sond û ehda xwe bîne cî û bikeve nava gundê Ceterê. Lêbelê bi çî qîmetekê!? Bi dana sedan kuştî û birîndaran û malwêraniyê zaf heta bikarin xwe bigihîştandin nava gund. Lê dîsan bi wê qîmetê jî nekarî bigijne wan armancên ku dixwast di şerê Ceterê de bidest bînin. Dijmîn dixwast wiha bêne nava gund ku hemû Kadro û Pêşmerge bikujin yan jî êxsîr bikin. Armanca wan ya sereke ewa bû, ne ewa ku bi dana wan hemû kuştian, tenê bêne nava gund ku Kadro û Pêşmerge lê nebin. Piştî şerê giran û bê hevta hêzên Pêşmerge neçar bûn sed mixabin bi dana 13 şehîd û 38 birîndaran gundê Ceterê bi yek carî cî bihêlin û bera xwe bidin bo aliye gundê Mîrava û Sakan. Mixabin xêncî wan 13 şehîdan kesekî xelkî gundê Ceterê jî hate şehîdkirin. Di wî şerî de gellek bûyer û qewimînên balkêş çêbûn. Pêşmerge bi awayekî gellek zehmet ji gund vekişyan û ew 38 birîndar xilas kirin û hatin gundê Mîrava û Sakan. Li wir digel pêşwaziya germ û gurr a xelkê rûbirû bûn. Gundê Ceterê û ciyên şer li beşa zaf ya navça Soma û deverên din yê herêmê ve diyar bû. Her ji destpêka şer de xêncî wan cî û warên ku şer lê diyar bû, hemû herêmên derdor jî li ber teqîna dengê top, katyoşa û sîlahên giran ku dever dihejand, haydarê şer bibûn. Xelkê herêmê bo wê hindê ku şer û berxwedanê bi çavê xwe bibînin û zûtir li rewşa Pêşmerge haydar bin, hatibûne gundên nêzik Ceterê. Xelkê herêmê bi çavê xwe didîtin ku dijmîn çawa bi hemû awayekê agir û asin bi ser serê xort û parêzvanên wan dibarîne. Bi ketina her topekê di çeperên Pêşmerge de, agir dikete dil û hinavê wan. Lê mixabin tiştek nebû ku ew bikarin di wê demê de bo parêzvanên xwe bikin. Tenê ewa ku ji destê wan dihat ewa bû ku li ber Xwedayê xwe rawestin û bo saxî û silametî û serkeftina Pêşmerge destê duayê bilind bikin.

Wextê ku em çûne gundê Mîrava û Sakan, her çawa li serê hate baskirin, xelkê zaf li gund û herêmê hatibûne wir û li ser rêya Pêşmerge kom bibûn. Dema wan Pêşmerge didîtin, çavên wan tîjî hêsir (rondiik, firmêsk) dibûn û gellek dimane heyirî ku çawa Pêşmerge sax mane.

Wextê ku ez û çend hevaleyê tevî hev gihîştin gundê Sakan, me dît ku xelkê wan gunda demeke dirêj e di nava sir û seqema zivistanê de rawestane û çav bi rêya hatina Pêşmerge in heta ku bizanin ka dawiya şer û çarenivîsa parêzvanên wan dê çî lê bêt. Xelkê zaf li jin û mêran ve bigre heta zarok û kalemêr û kalejînan hemû û hemû li ser rê û di kûçe û kolanan gund de kom kom rawesta bûn heta pêşwazî li Pêşmerge û egiştî û xweşmêrên mayî bikin û ji halê wan bipirsîn. Ewa rastî be, ew dîmen û menzerên ku wir ber çavê min ketin, bandora wan li ser min gellek ji yê bûyerên şerê Ceterê kêmîr nebû. Gellek malbat û kes û karên Kadro û Pêşmerge û xelkê dilşewitî yê herêmê bi zanîna şer hatibûn ku heta zûtir xebera şer û saxî û silametiya xweşmêrên demokrat bizanin. Bi hatina her deste û girûpeke Pêşmerge xelkê bi girî û zarî diçûne serê wan û ew digirtin hembêza xwe û çendî caran maç dikirin û xeber li wan dipirsîn. Wextê ku çavê wan bi birîndaran diket û xebera şehîdan dibihîstin, dengê girî û lorînê bilind dibû. Ji kalemêrê 80 salî ku bi destrecifok cigare dipêça û dikêşa heta kul û kovanên dilê xwe di wê cigara tal de ku bi zehmet dipêça derêxe bigre heta zarokên ber sing û memikên dayîkan di wê şîn û pêşwaziyê de beşdar bûn. Xelkê her wisa dildariya kes û karê Kadro û Pêşmerge didan û digotine wan ku "ew dê (Pêşmerge) niha tevî deste û grûpeke din bêt" û gellekan jî digotin ku "belê dema mirov şerê dewletê û daxwaza mafê xwe kir, dê bête şehîdkirin jî." Hêjayî gotinê ye ku her Pêşmergeyek nehatiba, her di rêza şehîdan de bûn. Ji ber ku kesî nedizanî ka çend şehîd hene û ew kî ne û her Pêşmergeyekê tenê haydarê şehîdbûna wan Pêşmergeyan bû ku bi xwe dîtibû.

Dema ku ez û hevalên xwe gihîştin nav koma xelkê di gundê Sakan de, Hecî Mihyeddîn (ku niha çûye ber dilovaniya xwe û riha wî bi bihiştê şad be, mirovekî Kurdperwer, welatparêz û naskirî bû û her gav xeberên Pêşmerge dipirsî û dişopand. Hecî Mihyeddîn di karê civakî di nava xelkê de herdem di pêşîn de bû) hate pêş û ez himbêz kirim û çendî caran û ser hev ez maç kirim û got: "Silêman! gotin tu jî şehîd bûyî!" Min jî gotê ku "mam Hecî ez carê sax im". Lê xebera Hecî rast bû, hevaleyê din bi navê Silêman şehîd bibû. Rastî gellek caran dayîk û baban û xelkê ez himbêz kiribûm, lê ew himbêzkirina Hecî Mihyeddîn hinde germ û bi dil bû ku min wisa hîs kir ez di himbêza dayîk û babê xwe de me. Rastî ew şer û berxwedana mêrxasane ya Kadro û Pêşmerge jî wê piştigirtin û fidakarî û germayiya xelkê me dihat û tê. Lewma nabe em çî caran wê hêzê ji bîra xwe bibin. Hembêza gel bo me hemû tiştek e, di her qonaxekê de dibe, bila bibe. Me kesê nedizanî ka çend şehîd û birîndarên me hene. Ji ber ku şevê şer wisa

lê hat, her girûp û desteyekê tenê haj xwe hebûn û nedizanîn ka ciyê dinê çî qewimiye. Ji ber vê hindê heta roja piştî şer jî me nedizanî eseh çend şehîdên me hene. Her wisa di dema rêkirina nûçeya şer ji bo navenda hizbê ji bo belavkirinê di Radyo Dengê Kurdistanê de, Pêşmergeyê hêza Qendilê bi şehîd hate xwendin. Lê piştî du roja bi alikariya xelkê ew Pêşmerge bi birîndarî hat û gihîştê hêzên Pêşmerge. Bi her awayekî be, hêzên me karî piştî wî şerî di gundê Sakan de hevdu bigirin. Piştî hatin û kombûna hevalan di gundê Sakan de, her hêz û lik û pel û desteyekê zanî ka çend şehîd û birîndarên wan hene. Di wê dema kêma de ku hevalên Pêşmerge hebûn, diviya her kes ku birsî yan tîni yan jî her hewceyek din heba, çibîci bike. Kadro û Pêşmerge dîsan wek caran li ser malan hatin parvekirin. Lê wê carê digel ji destdana 13 heval û 38 birîndaran bû. Her wisa diviya hemû wan birîndaran derman û çibîci bikin. Ew kar jî di wê zivistana sar û pîrr befr de gellek zehmet û dijwar bû. Hewce ye bête xuyakirin ku xêncî Kadroyên dermanî, du hevalên hêza ku çawa di şer de fidakarî û mêrxasî afirandin, her wisa di dermankirin û çibîckirina birîndaran de jî roleke mezin û berbiçav hebûn. Ew du heval jî Kekê Hecî Cundî û Kek Newroz ku her du jî xelkê Bakurê Kurdistanê bûn (Kamilê Reşo jî her di wî şerî de şehîd bû ku xelkê bakur bû). Li dema ku heval mijûlê dermankirin û bêhnvedanê di gundê Sakan de bûn, civîna berpîrsên siyasî û eskerî jî hate lidarxistin. Bo wê hindê ku bizanin bo sibê diviya li kîderê bimînin. Wê rojê biryar dan gellek zehmet bû. Ji ber ku sê roj û sê şev bû bê rawestan şer dom dikir. Fişekên me kêma bûn. Lê me gellek xema kêmbûna fişek û teqemeniyê nedaxwar. Ji ber ku Pêşmergan heta niha jî her bi fişek û teqemeniya dijmin li wan xistibû. Lê ya herî girîng ewa bû ku 38 birîndar bi me re ne. Di civînê de qisekirin dest pê kir, ka em sibê li kîderê bin. *(gellek hevalên berpîrs baş herêma nas nedikirin û zêdetir guhdariya hevalên şareza dikirin ku bizanin kanê kî dê ciyekî baş û minasib pêşniyar bike û ew jî dengê xwe bidin. Wek Kek Cefer Hamidî, Rehîm Salihzade, Bîrahim Şêxalî û Ew hevalên ku tevî herêma nasiyar bûn, evane bûn: Kek Elî Kaşîfûr, Hesen Bazûke, Mela Xalid Baqî, Haşim Îbrahîmzade, Şapûr Şucaî, ez (Silêman Keleşî) û çend kesên dinê jî hebûn, lê mixabin bi esehî di bîra min de nemanê).* Beşa zaf a hevalan hizra wan ewa bû ku nabe em herne gundan. Diviya em di çiya de bimînin. Ew çiyayê ku nezera wan bû, çiyayê Şêxbazîd bû. Her ew çiyayê ku sê fermande û sê Kadroyên jêhatî bi navên Kerem Keleşî, Bapîr Mewlûdî û Tajdîn Bêhnam çend mehan berê di wî çiyayî de şehîd bibûn. Min ku biranînek wiha tal û nexweş li Şêxbazîd hebû, qet nedixwast çî caran bera xwe bidme wê derê û dîsan şahidê ji destdana hevalên xwe bim. Ewa aliyekî atîfî û êhsasî ye meselê bû nek hemû pîrs. Lê ji aliyekî din ve jî, birîndaran nedikarî di ciyekî wiha sar û pîrr befr û bê îmkanat de tabê bînin. Heta man bo Pêşmergan jî li ciyekî bê dar û bar gellek zehmet bû, çî bigihîje kesên birîndar. Lewra min û hevalekî ciyek pêşniyar kir ku dikete ser sînorê navçên Enzel û Soma'yê. Lê di parvekirina herêmi de dikeve ser Enzelê. Ciyê hatî pêşniyarkirin, hem bona şer baş bû, hem jî gove wek avdanî lê bûn û mirov dikarî ji hemû aliyên ve hêviyên xwe kêma û zêde bi dest bixe. Piştî demekê gotûbêjê, hevalan ew cî bo manê pejirandin. Em diviya bi lez xwe amade û rê bikevin û navça şer bi cî bihêlin. Lê gellek ji birîndaran nedikarî bi pêyê xwe rê herin. Ciyê ku hatî diyarkirin, hem dîr e û hem jî rêya wê pîrr asteng û destnexweş e û mirov nikare birîndaran heta wir hilgire. Lê birîndaran baş rewş fêhm dikirin ku çî îmkanên dinê ji destê me nahê. Lewra diviya birîndar hêj zêdetir berxwe bidin. Ji ber vê hindê ewa di dest û qaweta wan de hebû dikirin bo rêçûn û hêskirina karê hevalên xwe. Her ku em di gundê Sakan - gundê Şehîd Niho Paşo- der ketin û ber bi ciyê manê çûn, em nêzîkî her gundekî dibûn, me serdana pag û ciyên ragirtina heywan û sawalan dikir bo



peydakirina hesp û guhdîrêjan(ker) ku birîndarên xwe pê xilas bikin.

Baş bû hevalan karî çendîn hesp û guhdîrêjan bona derbazkirina birîndaran peyda bikin. Me digel hezar zehmet û derdeseriyên wê şevê birîndarên xwe gihîjandin wan ciyê ku hatibû diyarkirin.

Dûmahîk heye...

Şiroveya Peyvên Siyasî

Berhevkar:
Omîd Esxeran
omid_anbi@yahoo.com



Ziyonîzm(zionism)

Ziyonîzm navê Bizava Neteweyî a Cihûyan e, ji ber ku li gor pirtûka pîroz a Tewratê, divêt hemû Cihûyên cihanê yek bigirin û di Felestîne de akincî bibin û ew hêviya xwe ya kevin bi cî binin. Zayon(Sion) navê

çiyayekê ye ku dikeve başûrê rojavayê "Quds"ê û armanc li Ziyonîzmê hewlidan û alîgiriya hemû Cihûyên cihanê ji bo gihîştin bi wî cihî di Felestîne de ye. Di sala 1822'an a Zayîni de, bi sedema komkujiya Cihûyan, bizavek bi navê "Bilon" ji aliyê Cihûyan ve hate çêkirin û bû sedema vê yekê ku gellek Cihûyan bo Felestîne bişînin. Damezirênerê bizava Ziyonîzmê, rojnamevanekî Cihû yê Mecarî bi navê "Têodor Hirtizl" (Theodor Herzl) e ku piştî beşdarbûn di pêvajoya dadgehîkirina Dirîfos de, di sala 1894'an de li Parîsê û birêveçûna çend xwenîşandanên li dijî Cihûyan di wî bajarî de, bona rizgarkirina Cihûyan ji wê berbiderî û azaran, hizr û bîra çêkirina dewleteke Cihûyan anî holê. Yekem kongireya cihanî a Cihûyan bona damezirandina dewleteke xweser li ser daxwazî û bangewaza Hirtizl, di sala 1897'an de li bajarê Bazil a Swîsê hate lidarxistin, di rastî de Ziyonîzm berhema vê kongireyê bû. Her wiha Hirtizl pirtûkek bi navê "Dewleta Cihûyan" nivîsî ku karî bi vî awayî bala hemû cihûyên cihanê bo aliyê xwe rabikêşe û rêyê bo bizava Ziyonîzmê xweş bike. Di kongireya cihanî a cihûyan de di sala 1897'an de, derheq cihê çêkirina dewleta cihûyan di nav endamên kongireyê de, pîrsgrêk û nakokî pêk hat, lê kesek bi navê "Kîm Vayzman"(Chim Weismann) û alîgirên wî, bi awayekî micid hewl didan ku dewleta han li ser erdê Felestîne bihê avakirin û belavoka "Balfor" jî ku di sala 1917'an de belav bibû, palpiştê rêrîna wan bû. Ji ber ku di belavoka han de dewleta Bîrtaniyayê jî avakirina dewleta Cihûyan li ser erdê Felestîne piştevanî dikir ku ewa jî weke serkevtineke mezin bo bizava Ziyonîzmê tê hesibandin. Piştî vê yekê Ziyonîztan gavên zêdetir avêtin daku cihû ber bi Felestîne koç bikin û erd, mal û milkê Ereben Felestîni ji wan bikin. Piştî serkevtina Nazîsmê di welatê Almaniyayê de û desthilatdariya Adolf Hîtler, bi sedema givaşê ku ji aliyê Hîtler û Ewropaya Rojhilat ve li ser cihûyan bû, koça cihûyan ber bi Felestîne zêdetir bû. Piştî şerê duyem yê cihanê, avakirina dewleta Cihûyan bi awayekî micid derket holê û Rêxistina Neteweyên Yekbûyî di meha Çiriya Paşîn a sala 1947'an de, pirojeya dabeşkirina Felestîne bo du beşên Erebi û Cihûyan pejirand û bi vî awayî yekem dewleta Cihûyan bi navê Îsraîl di meha Gulana sala 1948'an de ava bû. Her çend piştî avabûna dewleta Îsraîlê, alîgirên Ziyonîzmê gihîştin armancên xwe, lê çalakîyên vê bizavê di dawî nehatine, di qonaxa niha de, bizava han hewlê dide ku dewleta Îsraîlê di warê aborî, siyasî û berfirehtirkirina desthilatê de li ser asta navneteweyî bihêztir bike. Îro girîngtirîn navenda çalakiya alîgirên Ziyonîzmê di welatê Amerîkayê de ye û beşa herî zêde a sermayedarên Cihûyên Amerîkayê ku aboriya sereke a welatê Amerîkayê di destê wan de ye, hevkarîya bizava Ziyonîzmê dikin. Her wiha bizava Ziyonîzmê desthilateke zaf di nav dezgehên ragihandina Amerîkayê de heye û bi her awayî dikare bala raya giştî a wî welatî bo aliyê xwe rabikişîne û her wiha Ziyonîzm xwediyê yek ji bihêztirîn girûpên givaşê di Kongressa Amerîkayê û dezgehên hukûmetî ên wî welatî de ye.

Çavkanî: (Ferahngî Ramiyarî Nîga) Azad Weledbegî
(Danêşnamêyê Siyasî) "Political Dictionary"

Daryûş Aşorî

1'ê Gulanê, Têkoşîn Ji Bo Pêşerojeke Cuda



Arif nadirî

piştî derbazbûna 123 salan bi ser xwenîşandana karkeran anku di roja 1'ê Gulana 1886'an a Zayînî li bajarê Şikago

a Amerîkayê, karkerên cîhanê niha jî bi tawana daxwaza mafên xwe yê berheq û rewşa, bi girtin û kuştinê re berbirû dibin, heta li Komara Îslamî a Îranê, karkeran mafê rêzgirtin ji Roja Cîhanî a Karkeran nîne.

Sala borî ji bo qata karker, li Îranê û Rohhilata Navîn, saleke dijwar û pirrasteng bû. Bi awayekê ku destpêka sala 1387'an a Rojî(21.03.2008), tevî derxistina 50 hezar karkerên girêbestî hevdem bû. Piştî vê yekê, roja 30.04.2008, bi dehan kedkar li bajarê Sine hatin girtin û rastî cezayên girtîgeh û îşkencê hatin, di nav wan karkeran de çalakên karker yê jin jî dihatin xuyakirin, weke Şîwa Xêrabadî û Sûsin Razanî, ku ew jî ji aliyê dadgeha Şoreş a bajarê Sine ve, bi cezaya zîndan û lêdana qemçiyên hatin mehkûmkirin.

Ji aliyê din ve bi sedema xirabbûna rewşa aborî û pişeyî a parêzgeha Kurdistanê, asta bêkariyê di wê parêzgehê de roj bi roj jorde diçe û rejîma Îslamî a Îranê jî ne tenê tu alîkarî û sermayeguzariyên mezin nekiriye, belkû bi piraktîzekirina siyasetên şaş û nezaniyê yê aborî ji aliyê dewleta 9'an (kabîneya Ehmedî nejad) ve, yê bûye sedem ku çend fabrîka û kargehên biçûk yê deverê bi tevahî bihên daxistin. Bo mînak di sala 1387'an(2008) a Rojî de, fabrîkaya Ristin û raçandina Kurdistanê, şirketa pişeyî a ristina Rojavaya Kirmaşanê, Şirketa Atîla Ortopêd, Kanzaya Zêr ya Kurdistanê, Bendava Çiraxweys a Seqizê û hwd..., tûşî mayepêçiyê hatin û bi giştî 2555 karker li wan çend cihan îşare pêkirî de betal û bêkar bûn. Eva di demekê de ye ku pirraniya karkerên şaredariyan ku bi awayê girêbesta demkî dixebitîn, ji kar



hatin avêtin û heta li bajarên Seqiz û Dîwandereyê jî, karkeran miaşê xwe wernegirtiye.

Li gor raporekê ku "Çalakvanên parêzerê Mafê Mirovan" di çend rojên de belav kiriye, di sala borî de, 512 kedkar di dema karkirinê de jiyana xwe ji dest dane, 52 karker hatine binçavkirin û 29 karkerên din jî hatine dadgehîkirin yan ji bo navendên ewlekariyê hatine gazîkirin û 19 biryar li dijî karkeran hatiye derkirin.

Her li gor rapora çapemeniyan, di sala borî de miaşê 448222 kes ji karkeran nehatiye dayîn. Di vê derheqê de li gor belavoka "Mala Karker", di demsala zivistana (2009)de, 330 hezar kedkar ji kar hatine avêtin, bêy ku xwediye bîmeya bêkariyê bin.

Bi sedema siyaseta newekheviyê derheq Kurdistanê, pirsgirêk û arîşe çend qat zêde bûne. Ji aliyekê ve karker bi sedema nebûna alavên xweparastinê, nebûna girêbesta demdirêj, nebûna sendîkaya xweser a karkeran û ... dinalin, ji aliyekî din ve jî rejîma Îslamî a Îranê li hember hewldana karkeran bo

dabînkirina mafên destpêkî yê wan, gellek hestiyar e û bi awayên hovane, karkeran serkut û bêdeng dike.

Di vê derheqê de û di berebereya 1'ê Gulanê, Roja Cîhanî a Karkeran, 28'ê meha Xakelêwe(17.04.2009), bi sedan kes ji çalakên karkerî û endamên malbatên wan li bajarê Sine, ji aliyê rejîma Îslamî a Îranê ve hatine girtin.

Lê karkeran bêy tu tirsekê, roja îne, 01.05.2009'an, li bajarên Sine, Kirmaşan û Seqizê, Roja Cîhanî a Karkeran pîroz kirin.

Her çend komek ji çalakvanên karkerî li bajarê Sine, di dema birêvebirina rê û resma 1'ê Gulanê de hatin binçavkirin û bo girtîgehê hatin şandin, lê xebata berdewam ya karkerên Kurdistanê di çend salên dawiyê de û tekezkirina wan li ser daxwaziyên wan, nîşanderê hişyarî û vîna çîneke çewisandî ye ku dixwaze tîrsa siyaseta mista hesin ya Komara Îslamî a Îranê bişkîne û di tarîti û zehmetê de bidirrine. Hetaku di pêşerojê de, bihaya nan hemberî bihaya azadiyê nebe.

Doma rûpela 4'an...

Ji bo tevgera Tamîl, rola Hindistanê pîr giring e. Hindistan ji aliyekê ve ji ber hesasiyeten hevvelatiyên xwe yê ji esla xwe Tamîl neçar e tayê Tamîlên "Sri Lanka" bigre, lê ji aliyê din ve tîrsa hindê heye ku tevgera serbixweyîxwaz ya netewî ya Tamîl derbazî herêma "Tamil Nadu" bibe û rewşa hundir ya Hindê tevîhev bike. Lewma Hindistanê heya niha di wê arêşeyê de car ew mil girtiye û car ew mil. Lê ji bo xelkê Tamîl li Hindistanê qedera hevçarenûsên wan li "Sri Lanka" hertim giring bûye. Salên 1980'an, herêma "Tamil Nadu" bû serekaniya bingehîn ya alîkariya pere û çekan ji bo tevgera Tamîl li "Sri Lanka". Hindistanê sala 1991 hewlek ciddî da ku dê alîkariyê bide rawestandin. Lê ji bo ku Tamîlên xwe razî bike, kete navbera tevgera Tamîl û dewleta "Sri Lanka" û agirbesek da pejirandin û sala 1987 taximek hêzên çekdar ji bo navbeynkarî û parastina ewlekariyê şande herêmê. Lihevhatina aştiya navbera tevgera Tamîl û "Sri Lanka" ya bi navbeynkariya Hindistanê gihîştibû encamê, ji bo demek kin dengên çekan birrî. Lê ne soza dewletê ya bihêzkirina otonomiya herêmî hate cî û ne jî soza tevgera Tamîl ya ji bo danîna çekan. Dema serbazên Hindî ketin herêma Tamîlan, tevgera Tamîl bi awayekî fermî bi wan re şer dest pê kir. Paşan bi navbeynkariya Norwêjê agirbes çê bû, lê dubare şer dest pê kir. Ji wê demê ve car şer car agirbes û aşti tê herêmê, lê heya niha çî çareserî çê nebûne û şerê wê dawiyê hêviya çareseriyek lezgîn hê dûr dike.

Jordeçûna Asta Celteya Dil Di Nava Ciwanên Jêr 30 Saliyê Li Îranê

Serokê Civata Atriskilrozê ragihand ku asta nexweşiyên dil weke celteya dil di nava ciwanên jêr temen 30 saliyê di Îranê de jorde diçe. Eva jî di haleke de ye ku nexweşiyên dil di welatên pêşkevî ên weke Amerîkî û Ewrûpaya Rojava de dibe sebebê mirina kesên jordeyî temenê 70 saliyê.

Dr. Mihemedriza Mihemedhesenî di hevpeyvînekê de tevî ajansa MEHR' tevî ragihandina nûçeya han got: Herçend ku serhejmariyek rast û drust divê derbarê de li Îranê tune, lê belgeyên heyî û berçav ji bo min û gişt

hevkarên min eşkere dikin ku hejmara ciwanên ku tûşî kirîza han dibin, roj bi roj zêdetir dibin.

Li gor serhejmariyên Wezaretê Tendurustiyê, nexweşiyên dil di welatê Îranê de yekemîn sedema mirina Îraniyan tê nasîn û salane pîtir ji 300 hezar Îranî dibin goriyê vê nexweşiyê.

Serokê Civata Atriskilrozê, herwiha zêde kir ku tûşbûna ciwanên jêr 30 salî û hinek caran 23 heya 24 salî bi nexweşiyên dil weke celteya dil cihê nigeraniyê ye, li halekê ku seba encamdana çalakiyên bi cî û hewce di welatên pêşkevî de, pirsgirêka han heya astekê çareser bûye û temenê



kesên ku tûşî celteya dil dibin, jordeyî 70 saliyê ne.

Mamostayên Xwendingehên Dest Merîwanê Dane Gireva Nerazîbûnê

Roja duşem, 27.04.2009'an, pîrraniya mamostayên

xwendingehên bajarê Merîwanê, dest dane gireva nerazîbûnê.

Mamostayên xwendingehên bajarê Merîwanê, serbarê amadebûn di xwendingehan de, xwe ji dersgotinê parastin.

Her wiha qîrar e berrava 28.04.2009'an, hemû mamostayên xwendingehan bi awayekî seranserî gireva nerazîbûnê birêve bibin û li



gor daxuyaniya Navenda Sinfî a mamostayan, heya çibicînebûna daxwaziyên wan, dê gireva xwe bidomînin.

Hêjayî gotinê ye ku li pîrraniya bajarên Kurdistan û Îranê, gireva mamostayan bi awayekî sivîl birêve çûye. Her wiha komek ji çalakên mafê mirovan li Îranê di vê derbarê de ragihandin ku gireva han li bajarên Tehran, Kerec, Şehriyar, Robotkerîm, Reşt, Hemedan, Sine, Kirmaşan, Elîgûderz, Miyanduav, Seqiz, Îlam, Dîwandere, Îsfahan, Meşhed, Bucnûrd, Bender Ebas, Şîraz, Erak, Melayir, Erdebîl û her wiha di gellek bajarên din de birêve çûye.

Devera Bêlwar A Kamyaranê Bi Tevahî Hatiye Mîlîtarîzekirin

► Hêzên çekdar yê Sipaha Pasdaran a rejîma Îslamî a Îranê, devera Bêlwar a bajarê Kamyaranê, bi tevahî mîlîtarîze kirine.

Sipaha Pasdaran li devera Bêlwar ku di navbera bajarên Kamyaran û Merîwanê de hilketiye, li pîrraniya gundan û bilindahiyên binkeyên leşkerî çê kirine.

Her wiha Sipaha Pasdaran li gundê "Geşk"ê heya nêzîkî bajarê Merîwanê, çendîn binke û cihên lêgerînê ava kiriye û di nav gund de jî nexweşxaneyekî sehayî çê kiriye.

Hêzên Sipaha Pasdaran gundê "Zemangirîve" jî xistine bin dorpêça xwe.

Hêjayî gotinê ye ku pîrraniya wan hêzên ku di wê deverê de cihgir bûne, cil û bergên Kurdî lixwe kirine û hatin û çûna xelkê deverê xistine bin kontrola xwe.

Mîlîtarîzekirina devera Bêlwarê û serederiya dijîmîrovî a hêzên Sipaha Pasdaran digel xelkê, yê bûye sedema bêzarî û nerazîbûna xelkê wê deverê.

Kasibkarekî Kurd Li Şinoyê Hate Kuştin

► Şeva çarşem, 22.04.2009'an, hêzên çekdar yê rejîma Îslamî a Îranê, li cihê bi navê "Xergedaşan" li derdora bajarê Şinoyê, êrîş kirin ser komek kasibkaran ku di encam de kasibkarekî Kurd bi navê "Seyîdseîd Elewî" temen 50 salî, xelkê gundê Şawanê ser bi bajarê Şinoyê û akinciyê gundê "Taçînavê", jiyana xwe ji dest da.

Seyîdseîd Elewî ji rêya têledarî û kasibiya ser sînoran, debara malbata xwe dabîn dikir.


Hêjayî gotinê ye ku navhatî birayê du şehîdên rêya rizgariya Kurdistanê bi navên Seyîdenwer û Seyîdmihemed Elewî bû.

Kasibkarekî Kurd Li Selmasê Ji Aliyê Hêzên Îranê Ve Hate Kuştin

► Roja çarşem, 29.04.2009'an, kasibkarekî Kurd bi navê Bextiyar, xelkê gundê "Hêştirak" li devera Şipîran ser bi bajarê Selmasê, ji aliyê hêzên rejîma Îslamî a Îranê ve hate kuştin. Hêjayî gotinê ye ku xelkê Kurdistanê bi sedema bêkarî û bi neçarî dest bi karê bixeter li ser sînoran dikin ku salane dehan kes ji kasibkarên Kurd ji aliyê hêzên rejîma Îslamî a Îranê ve tên kuştin.

RÛMETA MIROV

ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com



Kaniya Helbestan

Soz



Hejarê Kurd

Berî ku jiyana li ber

Çavê min melûl bibe,

te digo ezê agir berdim

serê mûman û bişewitînim,

û bikim rohnê berdim nav kêlên
evîna te,

ji bo ku hestê

te di navda xwe bi dilê

sosinan ra bixuşînin.

Berî ku ez ji sozan

hêvî bikim, û dilê xwe bi

ewrên bê baran xweş bikim.

Kifarata hêviyên min

Li ber sozê qurmiçî

Bê serî diperpitînin.

Min go belkî te wê

A ber dilê min bixemlîne.

Min nizanîbû ku çîrokên te

Wê ciwaniya min bixapîne.

Min nizanîbû ku wê narvîna

Min desma reş girêde.

Min nizanîbû ku wê soz

Bervajî bibin û kerase

Derewan li xwekin.

Her mirov, ji ber mirovbûna xwe
xwedan rûmet, rêzdar û girambar e.
Belê, pesindetî, hurmetdarî an jî

bêgiramî û rêznezaniya mirov di destê
mirov bi xwe de ye. Yanî her mirov qelend
û buhayê xwe bi destê xwe dibire. Çawa ku
mirov du tovên dijber; ên jiyana û mirinê li
nik hev belê di xwe de dihevine, bi heman
awayî hest û raman, bizav û tevgerên erênî
û neyinî bi xwe re hildigire û dibe sedema
bêqîmetî an jî qîmetdariya xwe.

Albert Camûs dibêje :
"Heyinê ku dikaribe nîrx û wateyê bide
xwe, tenê mirov e."

Bêguman rast e, belê çî ye ku her mirov
bizanibe xwe nas bike û nîrx û wateyê bide
mirovbûna xwe. Helbestvan û fablûsê
Fransî "La Fontaine" jî vê yekê bi vî awayî
tîne zimên "Tiştê ku mirov bala xwe bidîyê
û yê sereke ew e ku mirov xwe nas bike."

J. Rousseau derbarê vê yekê de wiha
dibêje: "Her tişt di destê mirov de bînîrx û
çilviran (bêesl) dibe." Rast e belê bi ya min
hinekî kêmtir gotiye, lewre; her tişt di destê
mirov de binîrx û payebilind jî dibe. Bi
kinayî her tişt li gora vîn, bizav û kesayetiya
mirov dirûv digire. Derbarê vê yekê de
rîwayeteke olî (îslamî) ya balkêş heye. Li
gora gotegot û çavkaniyên îslamî, Xwedê
Teala, di hedîseke qudsî (qisepêdana
navbera Xwedê û Pêxember) de, Xwedê ji
deng li qasidê xwe dike û dibêjê: " Ey
peyamberê min (Muhammed) ! Gava ku
min, ajal xuliqandin tenê, min çil (nefs) da
wan. Ku min firîşte xuliqandin, min, tenê
hiş û aqil da wan. Belê gava ku min mirov
quliqand, min hem nefis (a heywanî) hem jî
hiş û aqil (ê firîşteyî) da yê. Heke nefsa
mirov serdestî hiş û aqilê wî/bibe û wî tîk
bibe, dê ew ji ajalên çar ling kêmtir û
sernewqîr bibe; na heke ku hiş û aqilê
wî/bibe serdestî nefsa wî/bibe û wî/bibe tîk
bibe, îcar dê ew ji firîşteyên nûranî jî
firazwertir û rûmetdartir bibe."

Ne tenê ol; çî raman, bîrdor, feraset û
nêzikayîtdanên ku hene, tev mirov wekî
navend û rîknê hemû heyîn û hêjahiyên
dinê dibînin. Her çend ku ev yek ji aliyê
teorîk ve wekî girîng û manîdar hatibe/bête
dîtin jî, di karvaniya jiyana de gelekî qels
maye/dimîne û zêde sîtavî tevger û bizavên
civakî û takekesî nebûye/nabe. Jixwe ku ne
wisa bûna, dê ji mêj ve mirovahî gihîştiba
merhaleyê payebilind û şareza. Bi rastî
mirov dikare bibêje bi tevayî mirovahiyê hê

peresîn û geşedaniya xwe ya komelayetî
temam nekiriye. Çimkî mirov ne tenê
heyineke ajalî (biyolojîk an daringî) ye.
Aliyê wî/bibe yê arîştî, giyanî, hestiyarî û
ramanî jî heye. Mirov bi gellek xislet û
taybetmendiyên xwe digihîje asta
mirovbûnê. Gava ku yek an jî çend
taybetiyên mirovî di mirov de peyde nebin,
dê gellek hêman û taybetiyên mirov ên din
jî nîvco bimînin û mirov ji tîkûzbûniya xwe
bi dûr bikeve. Heta serwer û zoranên dinê
ne. Pergalên cîhanê û çerxên jiyana, li gora
hest û ramana wan tîne damezrandin û
zivîrandin. Belê mixabin hê jî ew negihîştine
asta mirovbûnê û mirovatiyê. Gelo çima ?
Lewre, qedr û qîmetê, nîrx û hêjahiyê nadin
tu mirovan û tucar nakevin heyra mirov û
mirovahiyê. Her yek ji wan wekî navgîneke
candar a pergalê û sazûmanên neçê, hatine
peywardarkirin. Hertim bêyî (li derveyî) vîna
xwe tevdigerin. Ji aliyê kesên derveyî wan
nîr û hevsa di stûyê wan de hatiye danîn.
Û bi hêsa bi her hêlê ve tîne berafîkirin û
dezgînkirin.

Dibe ku her mirov nikaribe her car bibe
xwediyê vîn û tevgerê azad an
helwesteke tîkûz û serbixwe. Belê di her
demê de, her mirov dikare merc û
derfetên xwe bide zorandin û bi awayekî
bêlêçûn (bêmesref), dil û mêjiyê xwe bi
hest û ramanên tîkûz û mirovî bixemlîne.
Her çend ku tîkûz ku bê dirav û aborî tu
tişt pêk nayê an bidest nakeve, dîsa jî ji do
heta îro yên ku nav û dengê xwe bi tîpên
zêrîn li rûpelên dîroka mirovahiyê neqş
kirine, ewqasî ne xwedî mal bûne.
Berevajiyê wê, ewên xwedî mal, tucarî û di
tu dema de jî bi awayekî mayînde belê bi
qandî yên xwedî vîn, nebûne xwedî rûmet û
nav û deng venedane. Ne ku em rabin bi
hest û ramanên razdar(mîstîk) tevbigerin
an aboriyê di ser guhê xwe re bavêjin. Na.
Çimkî di cîhana me ya îroyîn de
hilmistandin û hilmdayîna mirovan jî
girêdayî aboriyê û rewşa wan a daringî
dirûv digire. Diviyabû ku aborî di suxreya
mirov û mirovahiyê de bûna, belê mixabin
îro mirov û mirovahî di suxreya aboriyê de
ne. Divê baş bête zanîn ku aborî ji bo
pêşerojê mirovî û jiyana bûye navgîneke
jênager.

Wekî gotina dawî ku P.Syrus jî dibêje: "Yê
ku rûmeta xwe wîna bike, tiştêkî wî/wê yê
ku wîna bike namîn.

111'mîn salvegera Rojnamegeriya Kurdî



Azad Kurdî

Roja 22'yê Nîsana 2009'an, Rojnamegeriya Kurdî bû 111 salî. Sed û yazdeh salan berî

niha û di 22'ê Nîsana sala 1898'an de, Miqdad Mîdhed Bedirxan li bajarê Qahîreya Mîsrê yekemîn rojnameya Kurdî bi navê **KURDISTAN** der kir ku weke yek ji destkevên herî girîng ên ronakbîriya neteweyî ji bo Kurdan tê hesabandin.

Derkirina yekemîn rojnameya Kurdî ji aliyê rewşenbîrê zana û navdar yê Kurd, Miqdad Bedirxan ve, ew jî di wê rewş û serdema dîroka siyasî a cîhanê de, gawek girîng û dîrokî bû ku karwanê wê şop û rêbaza pîroz niha jî her dom dike. Di van 111 salên borî de, rojnamevanên Kurd bi rêya rojname û çapemeniyên din û amûrên din ên ragihandinê ve karîne gellek xizmetên mezin û bihagiran bi prosesa rewşenbîrî û neteweyî a Kurdan bikin û ew rêbaza ku Miqdad Bedirxan li ber Kurdan danî, bidomînin û ji vê rêyê ve, Kurd jî mifahê ji rojname û çapemeniyên bistînin û di warê zanyarîdan û hişyarkirina civatên xelkê de bikar bînin.

Bêguman pirojeya derkirian yekemîn rojnameya bi Kurdî ji hûrbînî û ronakbîriya bîrmendê Kurd, Miqdad Bedirxan çavkanî digirt û wî bi başî hest bi valahiya hebûna çapemenî û ragihandinê ji bo Kurdan kiribû û bi başî hest bi bandora vê amûra girîng a ragihandinê bona pêşdebirina seha neteweyî û şiyarkirina xelkê Kurd bona pêşveçûna civaka Kurdî kiribû. Ew kar tenê ji mirovekî welatparêz, pêşverû û fîdakâr çêdibû ku wî karê mezin dest pê bike û serbarê asteng û dijwariyan, dehan hejmaran biweşîne, piştî endamên din ên malbata Bedirxaniyan rêç û rêbaza wî domandin û di qonaxên cur bi cur de, di warê rojnamegeriya Kurdî de jî xizmet kirin. Ji ber ku heta wê demê jî Kurd ne xwediyê rojname û çapemeniyên bûn. Di halekê de ku zêdetirî 300 salan berî wê demê, neteweyên din yê cîhanê bibûn xwediyê rojname û belavokan.

Derketina Rojnameya Kurdistanê bû xala guhertinê di bizava rewşenbîrî û neteweyî a Kurdan de û bû destpêkek nû û afirandinek mezin ku Kurd bi rêya pênuşê ve bikarin derd, êş û elemên

xwe û rewşa bindestî û zilm û çewisandina li ser xwe bînin ziman û hişyariya gel di nava civakê de berfiretir bibe. Heke mirov bibêje, ew gava ku zanayê navdar, Miqdad Mîdhed Bedirxan 111 salan berî niha avêt, şoreş û renesansek bû, mirov kêmtir negotiye.

Kurd her sal wê rojê weke Roja Rojnamegeriya Kurdî pîroz dikin, ji ber ku rêz û hrumetê ji vê gava bi bandor û dîrokî a Bedirxanê navdar bigirin û bibîr bînin. Bedirxan armanca rojnameya KURDISTAN'ê bi vî awayî dinivîsîne: **"Di dinyayê de çiqas Misilman hebin, di gund û bajarên hemûyan de dibistan û rojname hene, bûyerên ku li dinyayê diqewimin, di wan rojnameyan de têne nivîsin, lê mixabin ku kurd ji rojnameyan bêpar in û nizanin di dinyayê de çi diqewime, gelek tiştan winda dikin"**.

Ji wê rojê virde ku hîmê Rojnamegeriya Kurdî bi destên pîroz ê Miqdad Mîdhed Bedirxan hate danîn û Kurd bûn xwedî rojnameyê, karwanê rojnamevaniya Kurdî serbarê gellek asteng û dijwariyên neyar û dijminên Kurdan her berdewam û bêwestan xebata xwe domandiye. Lê hêj gellek maye ku bigihîje ew norm û standardên ku ragihandin û çapemeniya cîhanî heye û ew xewn û xweziyên ku Bedirxanê nemir bi fikr û ramana xwe ya kûr dest bi xebatê kir, hêj nehatine cî, ji ber ku çarenivîsa Kurdan bi giştî hêja negihîştîye wê astê ku bikare bi ser çarenivîsa xwe de zal be û serweriya Kurd di destê kurd de be.

Miqdad Mîdhed Bedirxan bi armanca gihandina dengê gelê kurd û hişyarkirina Kurdan Rojnameya KURDISTAN'ê weşand û gelê Kurd heta îro jî bi heman armancê têkoşîna xwe didomîne. Lê niha hem qonaxa xebata Kurdan û hem jî serdem guheriye.

Serbarê vê yekê ku sed û yanzdeh sal bi ser derçûna yekemîn rojnameya Kurdî ya bi navê KURDISTAN dibihure, lê bi pêşveçûna zanist û teknolojiyê, roj bo rojê Rojnamegeriya Kurdî jî pêş ketiye û niha dehan televîzyon, radyo, rojname, kovar û ajans û malperên înternetî ên Kurdî weşanê dikin û xizmetê bi ziman, çand, civak û nasandina doza neteweyî û deng û hawara Kurdan bi dinyaya derve û hişyarî û zanyarîgihandin bi kurdan

xebatên xwe didomînin.

Ji bilî Başûrê Kurdistanê ku Hikûmeta Herêma Kurdistanê ava bûye û rojnamegeriya Kurdî bi azadî û serbest weşanê dike, lê hêj li 3 parçeyên din ên Kurdistanê, rojnamegeriya Kurdî tevî asteng û qedexeyên dijwar berbirû ye. Girtin, binçavkirin, lêdan, îşkence û îdama rojnamevanan li Îran, Turkiyê û Sûriye bi xurtî ji aliyê her sê dewletên desthilatdar dimeşe û kesên ku bi karê rojnamegeriya Kurdî a serbixwe û bi ramanêke neteweyî re mijûl in, rastî dijwariyên jor tînin.

Li Başûrê Kurdistanê niha bi sedan rojnamem, Heftîname, Kovar, Televîzyon, Radyo û malperên înternetî ên Kurdî weşanê dikin û ji ber hebûna wê desthilata Kurdî û neteweyî, bi awayekî berfireh medya û ragihandina Kurdî pêşde diçe. Lê her sê parçeyên din ji ber bindestbûna Kurdan û sîstemên dîktator û zordar û dijberî tevî ziman, çand û nasnameya neteweyî a Kurdan, hemû liv û çalakiyek serbixwe û azad di vê derbarê de qedexe ne. Zext û zordariyek zaf li ser rojnamevanên Kurd heye û karê rojnamegeriyê bi dijwarî û zehmet tê meşandin. Nemaze rojnamevanên Kurd ên ku li ser mafê diyarîkirina çarenivîsa neteweyî, zulm û zorariya li ser Kurdan, pîrsa kurd bi giştî û nemze mafên siyasî, aborî, civakî û çandî ên Kurdan ku di Carnameya Gerdûnî a Mafê Mirovan de hatine, dinivîsin.

Di wan 111 salên borî de, qonaxa pêşketin û geşandina rojnamegeriya Kurdî li Kurdistanê rojhilat vedigere bo serdemê zêrîn û dîrokî ê Komara Kurdistanê ku di 11 meh ji desthilatdariya kin û kurt a Komara Kurdistanê de, dehan rojname, kovar, pirtûk û weşanên fermî ên cuda cuda hatin derxistin û Rojname KURDISTAN organa Komîteya Navendî a PDK Îranê ku niha jî xebata xwe a rojnamegeriyê didomîne, dihat weşandin.

Li Îranê ji ber ku 30 sal e rejîmeke dîktator û ne demokratîk û dijî kurd desthilatdariyê dike û maf û azadiyên berheq û demokratîk ên Kurdan tînin înkâr û bînpêkirin, rojnamegeriya Kurdî bi xurtî û berfirehî di bin siyaseta qedexeyê de ye û tu weşan û belavokek azad û serbest a Kurdî nahê dîtin ku bibe dengê xwestek û daxwaziyên gel. Lewra pîrriya rojname, kovar, televîzyon û radyo û malperên Kurdî ji aliyê rêxistin û

Îranê Pileya 181 Ya Azadiya Çapemeniyê Di Cîhanê De Heye

► Navenda Lêkolîna Medya û Çapemeniyên "Freedom House" (Mala Azadiyê), bi hilkevta 3ê Gulana 2009'an, Roja Azadiya Çapemeniyê, raporek nû belav kir û



ragehand ku Îran di nava 195 welatên cîhanê de, pileya 181 heye.

Di rapora nû a vê navendê de, Îran di nava 19 welatên Rojhilata Navîn û bakûrê Afrîqa de, di warê rewşa azadiya çapemeniyê de di pileya 17ê de cî girtiye.

"Freedom House" di berhevkirina raporên xwe ên derbarê azadiya çapemeniyê di cîhanê de, sê pîvanên siyasi, aborî û hiqûqî berçav digire. Vê rêxistinê di rapora xwe ya nû de renxe ji rewşa azadiya çapemeniyê di cîhanê de girtiye.

Çend rojnaveyanê Kurd niha di girtîgehên Komara Îslamî a Îranê de ne ku cezayê îdam û hepsên giran bi ser wan hatine birrîn. Bo nimûne Ednan Hesenpûr, Mihemedsidîq Kebûdvend, Mesûd Kurdpûr, Ebas Celîliyan, Kawe Cewanmerd, Behmen Totonçî û

DTP'yiyan Dest Dan Gireveke Berfireh A Birçîbûnê

Ji bo şermezarkirina girtina birêvebirên DTP'ê ji aliyê hêzên ewlekariya Turk ve, li Diyarbekirê hejmareke mezin ketine gireva birçîbûnê. Malperên Avesta û Netkurdê eşkere kirin ku ji bo protestokirina operasyonên li dijî DTP-ê, hemû serok, rêvebir, parlamenter û şaredarên DTP'ê li Diyarbekirê ketin gireva birçîbûnê daku bi vî awayî nerazîbûna xwe li hember êrîşên vê dawiyê ên dewleta Turkiyê bo ser endamên DTP'ê bidin



nîşandan. Hate ragihandin ku ji deverên cuda yê Bakûrê Kurdistanê bi hezaran kes piştigiriya vê meşê kirine. Şaredarê bajarê mezin yê Amedê, Osman Baydemir jî tevî gireva nerazîbûnê bû.

Li Îranê 130 Nûciwanên Bin Temenê 18 Saliyê Li Benda Îdamê Ne

► Roja îne, 1ê Gulanê, Dilara Darabî jina ku 6 sal bû di girtîgehê de bû, hate îdamkirin; rêxistin û komeleyên parêzerên mafên mirovan û dezgeh û saziyên navneteweyî ew biryar



şermezar kirin. Wê şeş salan berî niha, demekê ku temenê wê hêj 17 salî bû, di bûyereke de ku xizmekî bavê wê hatibû kuştin, hate girtin û cazayê lidarvekirinê bi ser de hate sepandin.

Dilara hunermend û nîgarkêş bû û di destpêkê de berpirsiyariya kesê kuştî girtibû stûyê xwe, lê piştê hate zanîn û îtiraf kir ku wê ev yek seba hezkirin û evîna bi kurapê xwe re ku bikujê eslî bû, pejirandibû. Civata Parêzerên Mafên Mirovan ku li Îranê têkoşinê dimeşîne, serbarê mehkûmkirina îdamkirina Dilara'yê, ragihand ku di 3 salên borî de, 32 zarok di cîhanê de hatine îdamkirin ku 26 xal ji wan di Îranê de bûne. Tenê di sala borî de 6 nûciwan li Îranê hatine daliqandin û vê gavê 130 nûciwanên jêr temenê 18 saliyê bi birrîna biryara îdamê, li benda meşandina wê biryarê ne.

Topbarankirina Deverên Herêma Kurdistanê Ji Aliyê Hêzên Îranê Dom Dike

Di çend rojên borî de, topxaneyên Komara Îslamî a Îranê ji çend cihan ve berdewam hin deverên Herêma Kurdistanê bi awayekî



berfireh topbaran kirine. Hate ragihandin ku bo yekemîn car, hêzên Sipaha Pasdaran bi Helikopteran êrîş kirin ser axa Herêma Kurdistanê û zîyan û xisarên zaf gihîjandine xelkê wan deveran û sedan kes ji xelkê niştecih yê deverên topbarankirî malên xwe bi cî hêlane. Di çend rojên borî de, serbarê topbarankirina çiyayên binara Qendîlê, hêzên rejîma Îslamî a Îranê deverên Hacî Omeran û Pêncwînê jî dane ber êrîşên xwe. Çend welatîyên sivil di encama wan êrîşan de bi xurtî birîndar bûne û rewşa herêmên ser sînorê Îranê û Herêma Kurdistanê aloz û tevliheve. Serbarê vê yekê ku Hikûmeta Herêma Kurdistanê û Parlamentoya Îraqa Federal êrîşên vê dawiyê şermezar kirin e, lê hêzên Komara Îslamî li ser êrîş û topbaranên xwe berdewam in.

Ev 2 sal in ku Komara Îslamî deverên ser sînor ên Herêma Kurdistanê topbaran dike.